

Rêzik ji bo kesên bi COVID-19- nexweş ketine u ji bo kesên bi wan re ketin têkilîya nêzîk.

Di qarantîna de bimînin!

Hûn bi nexweşîya COVID-19 ketine an jî bi kesekî nexweş re ketine têkilîyê. Divê hûn di qarantîna de bimînin. Pêkanîna qarantîna bi biryar zagon e.

Karantîna tê wê manê ku ketina têkilîyê bi kesên din re qedexe ye. Tenê bi vî awayî hûn kesên din bi nexweşîyê têkil nakin.

Divê hûn di dema Qarantîna de bi çi baldar bin?

Divê hun ji mala xwe dernekevin. Ku hûn bi zêde kesan re di malekê jîyan dikin, divê hûn xwe di xurfekê de îzole bikin. Hatina mêvanan jî qedexe ye.

Ji heval u naskirîyên xwe rica bikin ku ji bona we danûstandinê bikin. An jî danûstandinê li ser rîya firmeyên belavker bikin. xwarinên we divê li ber derîyê we werin danîn. Ji bona postboks u qutîyên çopê jî dernekevin. Alîkarîyê ji heval u naskirîyan bixwazin.

Ger hûn alîkarî nikaribin ji kesên din bistînin, hûn dikarin li sazîya tenduristîyê bi telefon bigerin.

Cihê karê xwe agahdar bikin!

Qopîyek ji vê nivîsê ji cihê karê xwe re bişînin. Ku hûn kesên têkilîya dûr bin, test ji bo korona hewce nabe. Ku cihê karê we testa korona bixwaze, divê malîyeta wê bigre ser xwe. Dîsa jî hûn mecbûrin di qarantina de bimînin.

Kesê têkilîya nêzîk kî tê naskirin?

Kesekî ku pozîtîf hatîye test kirin, 2 roj berî ku nîşanên nexweşîyê kufş bibin, têkil e.

Kî bi kesekî ku pozîtîf hatîye test kirin, ketibe têkilîyê, wek kesê têkilîya nêzîk tê naskirin.

Têkilîyek nêzîk tê holê

ku kesek bi kesekî nexweşre ketî be têkilîyê

- u hevditîn zêdeyî 15 deqge hatibe domandin
- u mesafe kêmî 1,5 metre pêk hatî be

Ku bi kesê pozîtîf hatîye test kirin re semptomên nexweşîye tune bin, 7 rojên berîya testa koronayê tîn hejmartin.

Li gorî vê, kesên têkilîyê ew kesin, ku bi wan re di 7 rojên derbasbuyî de têkilîyên nêzîk pêk hatine.

Kesên têkilîyên nêzîk divên di qarantîna de bidomin.

Hûn bi COVID-19 nexweş ketine?

Wê demê divê hun **10 rojan** di qarantîna de bimînin.

Qarantîna di roja ku hûn nîşanên nexweşbûnê ferq bikin dest pê dike. Ku nîşanên nexweşiyê tune bin, qarantîna di roja testa-Corona dest pê dike.

Lîsteya têkilîyên xwe çê bikin!

Navên kesên ku bi were 2 roj berîya nîşanên nexweş derketin u heya destpêkirina qarantîna binivîsin.

Ger nîşanên nexweşiyê bi we re dernektî bûn, wê demê navê wan kesan binivîsin, ewên ku hûn bi wan re 7 roj berîya testa korona di têkilîyê de bûn. Di lîsteya têkilîyan de van agahdarîya bidin:

- Nav
- Paşnav an jî navê dayikbûn
- Rojbûn
- Cinsîyet
- Karmendî
- Kolan
- Qoda postê, cîh
- Telefon/ hejmara telefona mobîl
- E-Mail

Minak ji bona çêkirina lîsteya têkilîyan hûn dikarin di înternetê de bibînin: <https://www.berlin.de/ba-reinickendorf/corona/>

Têkilîyên xwe yên nêzîk agahdar bikin!

Li kesên di lîsteya xwe de bi telefon bigerin u agahdar bikin.

Ger hûn die dema şûbheyê de bi dibistan an jî bi kargehê di têkilîyê de bûn, mamoste an jî îdarê bi telefon agahdar bikin. Îdare divê têkilîyên nêzîk agahdar bike.

Ji têkilîyên xwe yên nêzîk re bêjin ku hûn ê 14 rojan di qarantîna de bimînin.

Qarantîna ji bona têkilîyên nêzîk di roja ku nîşanên nexweşiyê derketin divê dest pê bike.

Ger nîşanên nexweşiyê tune bin, wê demê qarantîna bi hevdîtina dawî bi ya têkilîyê dest pê dike.

Hûn têkilîya nêzîk in?

Wê demê divê hûn **14 rojan** di qarantîna de bimînin.

Ger nîşanên nexweşîyê tune bin, hun dikarin piştî 10 roj di qarantîna de, testa korona çê bikin. Ku testa we negatîf derket, qarantîna bi dawî dibe.

Kesên têkilîyê ku bê nîşanên nexweşîyê bin, ne hewceye werin test kirin. Ger hûn tenê kesê têkilîyê bin u nîşanên nexweşîyê bi we re tune bin, hûn wê demê ji alîyê sazîya tenduristîyê nayên test kirin.

Ger bi we re wek kesekî têkilîyê, nîşanên nexweşîyê hebin, hûn dikarin ji sazîya tenduristîyê ji bona testa-korona serî lêdin. Nîşanên nexweşîyê bi mînak Agir, kuxik, an jî zekem in.

Li Sazîya Tenduristîyê Reinickendorf bi telefon di bin hejmara 030 902 94 55 00 bigerin. Ji bona testa-korona hevdîtinek çêkin, ji ber ku bi hevdîtin hûn nayên test kirin. Ger hûn ne kesekî têkilîyê bin, lê nîşanên nexweşîyê hebin, hûn dîsa jî alîye sazîya tenduristîyê nayên test kirin. Ger hûn bixwazin testa-korona çê bikin, ji Doktorê xwe an jî ji Doktora xwe yê malê birs bikin

Hûn dikarin wusa bighêjin me:

Gesundheitsamt Reinickendorf

Telefon: 030 902 94 55 00

Demên vekirî: Dûşem heya Yekşem
09:00 bis 15:00 Uhr

Înternet: <https://www.berlin.de/reinickendorf/gesundheitsamt>

Dema Agahdarî: Kanûn 2020